Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1269 30-Nîsan-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# Girê Endarê xwedî şaristaniyeke dîrokî ye

Diyale Nîdal \Qamişlo

**Li Rojavayê Kurdistanê gelek cihên dîrokî hene yek jê Perestgiha Girê Endarê ye, herwiha Girê Endarê 50' km an ji bajarê Helebê dûr e. Girê Endarê bûye şahidê gelek serdemên dîrokî û xwedî şaristaniyek kevnar e.**

Her herêmek bi dîrok û çanda xwe tê nasîn

Her herêmek bi dîrok, şûnwar û çanda xwe tê nasîn, Rojavayê Kurdistanê jî bi dîroka xwe ya kevnar dewlemend e. Bi hezarê salan e gelê wê herêmê di nav şert û mercên herî dijwar de dijîn û bi gelek qirkirinên çewsandina vê çandê re rû bi rû mane. Şêniyên Efrînê tevî hemû hewildanên hêzên qirker parastina keneşopiyên xwe yên civakî û şûnwarên xwe yên dîrokî dikirin. Di Efrînê de gelek deverên dîrokî hene weke Kela Nebî Hûrî, Kelha seman, Kilûte, Girê Endarê û Cindirêsê hene. Her wiha gelek deverên dîrokî yên şopa mirovan lê hene.

**Girê Endarê**

Perestgiha Girê Endarê 50' km an ji bajarê Helebê dûr e û bi qasî 3'ê km an dûrî navenda bajarê Efrînê ye. Dirêjahiya gir nêzî 270 metreye û firehiya wê 170 metreye, her wiha bilindahiya wê jî dighêje 30 metreyî. Gir bi sûran dorpêçkiriye, ev sûr ji çemê Efrînê dest pê dike û heya 300 metreyan dirêj dike. Li kêleka Girê Endarê gundê Endarê heye nav de korîdor hene û gundên weke Bêlan, Îsalhiyê û sencilrî bi hev dide girêdan. Ev korîdor xwedî girîngiyeke stratîjîk e û bi armanca parastina ji êrîşan hatibû avakirin. Di heman demê de ew perestgeh di gelek serdeman re derbas bûye û li hemberî hemû rewşên avhewayê xwe pastibû, lê di sala 2018'an de û bi êrişên dagirkeriya tirk re girê Endarê hate wêran kirin.

**Şopên dîrokî yên Girê Endarê**

Li gor xebat û lêkolînên li ser Girê Endarê hatine kirin, 8 hezar sal B.Z û vir ve mirovan li vê deverê jiyan kirin e. Li başûrê girê mezin ê Endarê û bi dûrahiya 100 metreyan girekî din ê biçûk heye, mirovan di wan serdeman de ser wê çandinî pêkanîne. Li ser gir gundekî biçûk hatibû avakirin di gelek pêvajoyên dîrokî yên pêşketî re derbas bûye weke serdema Hîtît, Hurî, Mîtanî, Aşûrî û Medî û derketiye ku jiyan li wî gundî heta sala 1086'an berdewam kiriye. Tê gotin ku dema herêm dikeve bin desthilatdariya Selçûqiyan ji bo winda kirina şopên dîrokî gund hatiye şewitandin. Her wiha bi rêya lêkolînan hate diyarkirin ku niştecihên gundê Endarê yên kevnar di çêkirina hesin de navdar bûn. Li ser Girê Endarê ji aliyê Bakur de perestgehek heye, ji kevirên Bazalt an jî Bezilêt ên hûr hatibû avakirin. Li ser dîwarên wê formên pir berbiçav hatine neqişkirin, mîna şêrên bi bask û neqşên jinan bi awayekî beramberî hevdu hatine çêkirin. Ev neqş yek ji peykerên herî xweşik ê di dîrokê de tê pênasekirin.




Di perestgiha Girê Endarê de li gor lêkolînvanan di sala 1965'an de diravên zêr û zîv ku vedigere gelek serdemên dîrokî hatine dîtin. Di heman demê de peykerên xwedewandên Hurî, Mîtanî, Hîtîtî û Medî hatine keşif kirin. Di pêvajoya kolandinê de peykerê zilamekî hût ku çoka wî dighîne nîviya bilindahiya wî lawirî, hate dîtin. Piraniya van peykeran di perestgehên Mîtanî de têne dîtin. Di sala 1965'an de Kovara El-Holiyet a Sûriyeyê bi zimanê Fransî li ser navê Serokê Erka Keşifê M. Morris Dunand derbarê Girê Endarê de ragihandibû ku Xwedewanda li Endarê xwedawanda rojê ye û bi navê "Xwedawand Tîşop" tê naskirin. Neqşeya şêrên li ser dîwarên Endarê hatine keşif kirin vedigerin sedsala 13'an B.Z. Herwiha ji aliyekî din ve di perestgeha Endarê de taybetmendiyekî din jî ku li tu cihekî din nayê dîtin, ji kevirên kirêcê ve blokên hatine çêkirin û li ser wan jî şûna ling hatiye kolan. Her şopekî pî ango lingekî nêzîkî yek metreyî ye û ew yek di hunera perestgehên Hîtît de wek sembola şûnpêyên xwedê ye.

**Şûnwarên Persetgiha Girê Endarê hatin dizîn û firotin**

Di 20'ê Çileya 2018'an de dewleta Tirk a dagirker û komên çeteyên girêdayî wê êrişî kantona Efrînê û gundewarên wê kirin. Di encamê êrîşan de gelek zirar gihandin mirov û xwezayê. Di van êrişên hovana de gelek şûnwarên dîrokî yên Efrînê hatin hedef girtin. Piştî dewleta Tirk a dagirker di 18'ê Adara 2018'an de Efrîn dagir kir, kiryarên dij mirovî jî li ser gelê herêmê dan meşandin. Cihên dîrokî yên Efrîn û şûnwarên wê jî hatin dizîn û rûxandin. Girê Endarê ji van êrişan bê par nema û hemû şûnwarên wê hatin dizîn û li welatên derve hatin firotin.



Bi kamîreya Ayşa Silêman



Elî Gamêş

## FERHENGA BIWÊJAN

**Vala çû:**
- Bû zerer; bû xusar.

**Wê serê wî/stikura wî bikeve navbera derî û darê sîwanê:**
- Wê zerereke pir mezin bibîne.

**Xercê xwe jî dide, serê xwe jî dide şkandin:**
- Hem malê wî diçe, hem lê tê xistin.
(Kesê di du aliyan de zererê dibîne jê re tê gotin)

**Xwe daweşand:**
- Tiştek li cem xwe nehişt.

**Xwelî lê bû:**
- Zerereke mezin dît; perîşan bû.

**Xwelî li xwe kir/xwelî li serê xwe kir:**
- Xwe xist zererê; karekî xirab kir; xwe xusirand.

**Yan ji diya min, yan ji diya te:**
- Yan ezê bi ser bikevim, yan tuyê. Yan wê Xwedê bide diya me, yan **bide diya wan:**
- Yan ewê zererê bibînin, yan em.

**LI SER PIRBÛN Û ZÛPIRBÛNÊ**

**Bû çol:**
- Pir bû.

**Bû çola filan tiştî:**
- Bi heman wateyê.

**Dide çokan:**
- Pir e, gelek e, zehf e.

**Ev lêlê ye, hê lolo maye:**
- Tişta te bihîstî ne ew tenê ye; hê gelek maye. (24)

**Gozek û gozek dibe dêzhek:**
- Tişt ji hindik mezin dibin.

**Ji heftsalî heta heftêsalî:**
- Ji yê herî piçûk heta yê herî mezin.

**Kevir bidire:**
- Bibe bibe, hebe hebe, enceq.
(Kevir bidire enceq bîst kîlo goşt jê derkevin)

**Li beriyê li siwaran digere:**
- Tişta tu behsê dikî pirr e.
(Berî cihê siwaran e)

**Li qirikê ne:**
- Pir in.

**Li ser riya Helebê li nalên keran digere:**
- Tiştên tu behsa wan dikî pir in.

**Ma kerê (deyn) sêwiyan e:**
- Te çima wisa tijî kir?
(Dema hin ji kesên sêwî tiştekî ker dikin, ji bo ku gunehê wan nekeve stûyê wan, dema kerên wan didin ji heqê wan pirtir didin)

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Berxwedana Bendava Tişrînê berxwedana hebûnê ye'



Nûçegihana Jin Tv Loriştan Derwîş diyar kir ku ev zêdeyî 110 rojan e li Bendava Tişrînê berxwedaniyeke bêhempa tê meşandin, herwiha destanên dîrokî tên nivîsandin û got, "Berxwedana Bendava Tişrînê berxwedana hebûnê ye."**R-5**

## 'Ev konferans, bi keda hemû pêşengên Kurdistanî pêk hat'



Endama Desteya Rêveber a ENKS'ê Fesla Yûsif diyar kir ku rola hemû pêşengên Kurdistanî di lidraxistina Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî li Rojavayê Kurdistanê de hebû û wiha got: "Em rola taybet ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di yekrêzî û yekîtiya Kurdan de pîroz dibînin û hêviya azadiya wî dikin."**R-3**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1269 30-Nîsan-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# BÊYÎ AZADIYÊ AŞTÎ NE PÊKAN E

Tevgera Azadiyê û gelê Kurd bi hemû hêza xwe xwedî li banga Rêber Apo ya 'Aştî û Civaka Demokratîk' derketin û ev 2 meh in hewl didin ku vê bangê rast fêm bikin û bi awayekî serketî pêk bînin. Lê dewleta Tirk heta niha polîtîkayên qirkirinê dewam dike û ji bo serxistina banga Rêber Apo gav navêje. Eşkere ye ku aştî bêyî azadî û demokrasiyê nabe. Bêyî azadiya Rêber Apo û rawestandina êrişên ser Kurdistanê ne mumkin e aştiyeke rasteqîn pêk were.**R-4**




## Gerek Were Zanîn Ku Mêritî Desthilatdarî ye



Gerek were zanîn ku mêritî desthilatdariyeke pir çors û tundrew a 5000 sal in ku jin û di kesayeta jinê de civak koledariyeke pir kûr jiyan dike û têgeha koledariyê bûye perçeyek ji jiyana jin û civakê.**R-2**

## Melevan Resûl; Aşiqê zimanê kurdî



Nivîskar Melevan Resûl diyar kir ku wî ciwaniya peyva Kurdî di çîrok û çîvanokên kevneşopiya Kurdî ji devê dayîk û xwîşka xwe ya mezin bihîstin, roj bi roj heskirina ziman û çanda devokî di dilê wî de mezin bû û bû aşiqê zimanê xwe.**R-7**

## 'Bi hişmendiya DAIŞ'ê jinên Berava Sûriyê tên kuştin'



Rêveberiya Rêxistina Sara Nisriya Mehmûd diyar kir ku HTŞ'ê bi hişmendiya DAIŞ'ê jinên Berava Sûriyê dikujin û wiha got: "Pêwîst e hêzên navneteweyî li hemberî komkujiyên li Berava Sûriyê tên kirin, bêdeng nemînin."**R-6**

'Kuştina Zilam rêgeza bingehîn a sosyalîzmê ye'
Nehîr pale R-2

Dixwazin bi HTŞ û serjêkirinê Kurdan têk bibin
Zekî Bedran R-5



Nameya Xalid Beg û Rêber Apo
Farûk Sakik R-5

# Gerek Were Zanîn Ku Mêritî Desthilatdarî ye

**Asya Weşûkanî**



Gerek were zanîn ku mêritî desthilatdariyeke pir çors û tundrev 5000 sale ku, jin û di kesayeta jinê de civak koledariyeke pir kûr jiyan dike û têgeha koledariyê bûye perçeyek ji jiyana jin û civakê. Koledariya hişk a ku bi şikestina zayendî a jinê ya yekem re hatiye, destpêkirin û bi şikestina zayenda jinê ya duyemîn re jî, derketiyê lutkeyê û îro jî qawiseke pir mezin jiyan dike. Lê tekez gerek were zanîn ku dembûriya wê desthilatdariyê, hatiye û gerek ji bingeh de were şikandin. Ji xwe Rêber Apo di mijara şikandina azayenda jinê de, wiha şirove kiriye û gotiye" Di dîrokê de du şikandinên pir mezin ên zayenda jinan, hatine jiyan kirin û bi tekoşîna jinê ya xurt wê şikandina sêyemîn berelehî (Berevajî şikandina zayenda jinê, wê şikandina desthilatdariya mêritiyê be" û niha jî em wê şikandinê jiyan dikin.
Mêritiya ku bi Şamanan (Kalemêr yan jî rûsipî) hatiye destpê kirin, îro jî pirsgirêka serke û herî giran têye pêşiya mirovahiyê û xwe ji bo çareser kirinê bi lezgînî ferz dike. Û di sedsala 20 an de Rêber Apo dest bi lêpirîsîna, vê pirsgirêkê weke redkirina peywendiyên civakê yên di nav malbatê de û herî zêde jî tekoşîn li hemberî peywendiyên di navbera mêr û jinê de, kir û got ku bingeha tevahî peywendinê civakê peywendiyên di navbera jin û mêr deye. Û sir û xeleka wê ya wendayî û yekem jî, ewe ku di şikestina jinê û desthilatdariya mêr deye. Naxwe tekez gerek li wê sirê were gerandin û tekoşîna wê, were dayîn û gerek were zanîn ku ciyê wê sirê jî tekez veqetîna qatmanî a di navbera jin û mêr deye ku ew jî bi komploya Şamanan a li hemberî jina xwedawend bûye û ji wê demê de, jin ketiye nava qebreke tarî de û êş azar dikşe.
Careke din Rêber Apo bal kişandiye ser komploya li hemberî dayika xwedawend û gotiye Bi wê komployê re şikandina jinê ya yekem, hatiye jiyan kirin. Û gerek jin xwe bi rêxistineke pir xurt tekoşîn bike û tolhildana dîrokî, werbigre û ew tolhildan jî wê bi şikandina siyemîn ku wê berelehî mêr were kirin. Lê di nerîna min de gerek ev mijar pir baş û bi zelalî were, famkirin ji ber ku mijareke pir hesase û dibe ku carnan jî were berevajî kirin û bibe sedema ku hesasiyeta di navbera, jin û mêran de hîn zêdetir jî bibe. Tekez mijara şikandina zayendî ji demên pir kevin de, Rêber Apo xistiye rojeva jinan de û paşî bi pêşengtiya jinan û bi rêbazê perwerda bîrdûzî û xweser a mêran jî kete rojeva mêran jî lê herî zêde di çerçoveyeke teng de ma û nekete, rojeva civakê jî.
Ji ber vê min xwest ku ez careke din jî vê mijarê bibîrbixim û bibêjim, ku tekez gerek ev mijara bingehîn û sereke têkeve rojeva civakê de û pir jî baş were famkirin. Ez bixwe li ser vê mijarê pir lêhurbûn dikim û wiha dihizirim, ger ku Rêber Apo ewqase belge (Meteryal) weke berhemeke zêrîn daniye holê de û weke Rêberê yekem ku weke durişme gotiye, ku perwerde, perwerde û beriya nan û avhewayê perwerde û jin û civaka Kurd aniye vê qunaxê. Lê hîna jî di Kurdistanê de rojane bi dehan jin bi destê bav, bira, hevser û evîndarên xwe ve; têne qetil kirin û bi rêbazên herî tundrew û dermirovî û ev jî nîşaneya, ku hîna jî mijara peywendiyên şaş û ji rêderketî ên di navbera jin û mêr de ne hatine famkirin.
Naxwe hîna jî pêdivî heye ku bi kûrahî li ser vê mijara, serke û heyatî ji hêla jin û civakê ve were ponijandin û bi tekoşîneke; pir xurt were bi encam kirin. Ez weke qinyata xwe ya kesayetî pêdivî dibînim ku, wiha jî bi lêv bikim û bibêjim: Em weke jin û civaka Kurd heyanî pileyekê têgihiştîne û em ketine, nava hewildana ku, em ji ked û tekoşîna Rêber Apo re bibin bersiv û tekoşîna xwe; bi encam bikin. Û tevî wê jî em dibêjin ku hîna jî li gorî ku têye xwestin em, ji Rêber Apo û tekoşîna wî a 52 salan re nebûne bersiv û em; rexnedayîna xwe didin. Lê hîna jî di nava civakên din de yên Rojhilata Navîn û Cîhanê de, rojane bi dehan jin têye kuştin, kirîn û firotin û her cure tundî li hemberî wan têye kirin û ji hêla; saziyên mafê mirovan û peymanên hukukî ve rewşa, jinan têye paşguh kirin û tevahî kiryarên li dijberî jinan xwezayî têne dîtin.
Lê gerek neyê ji bîr kirin ku di van du salên dawiyê de, li Surî, Tirkiye, Îraq, Îran, Efganistan û Yemenê jî, tekoşîna jinan û lêgerîna wan a azadiyê dertê pêş. Û ev jî ciyê serbilindî û kêfxweşiyeke pir mezine û herî dawiyê jî li welatên derve jî tevgerên jinan, xwe bi rêxistin kirine û weke nimûne jî jinên Meyanmarê jî di salvegera; sazûman kirina Yekîneyên Parastina Jinan, YPJ ê jinên tekoşer û azadîxwaz ên Meyanmarê salvegera YPJ ê pîroz kirin û gotin ku; em îlham ji tekoşîna jinên Kurd digirin û wan jî xwe bi rêxistin kirin, tekez ev jî ciyê kelecaneke mezine. Û weke ku têye zanîn Rêber Apo rola pêşengtiyê daye jinên, Kurd û cardin jî mirov dikare bibmêje ku em weke jinên Kurd; gelekî xwedî şens û sudin ku Rêber Apo em ji xewa giran şiyar kirin û kirin, artêş û partî ji bo ku em tekoşîna xwe bigihînin tevahî jinên cîhanê. Û di dawiyê de jî mirov dikare ji bo şikandina zayendî a siyemîn de, jî wiha bi nirxîne û bibêje Em di serdema siyemîn a şikandina zayendî de jiyan dikin û ew jî, têye wateya ku ne tenê jin mêr jî gihaştine qinyata ku gerek desthilatdariya; mêr a çors û tundrew were şikandin û wê bi dawî kirina şer û tundiyê pêkan bibe. Û weke ku em tev jî şahidiyê dikin û dibînin ku jin û civak, tevahî bi hevre û bi ruhekî sosyal (Komcivakî) helwesta xwe ya; li hemberî şer û tundiyê datînin û dibêjin: Em şer naxwazin û em tev jî bi fikir û ramanên Rêber Apo, rene û gerek em careke din jî balê bikişînin ser peyama, Rêber Apo û bibêjin. Peyama Rêber Apo a 27 ê sibatê ya ji bo aşîtî û civaka, demokratîk û em bibêjin ku tekez civak li çareseriyeke wiha digere. Û bi taybet jî dema ku li çar perçeyên Kurdistanê û Rojhilata Navîn û Cîhanê, di heman katjimêrê de, li meydanan bi komî li peyama Rêber Apo a ku li Îstanbolê guhdar kirin û di dawiyê de gotin ku Rêber Apo çi bibêje ji bo me, bingeh û serekeye û em ji Rêberê xwe bawer dikin. Di wê kêliyê de derkete hole ku tevahî gel şer û tundiyê qebûl nake û wê li, hemberî şer û şerxwazan tekoşîn bikin û ji xwe peyama Rêber Apo; pir zelal jî diyar bû li hemberî şer û şerxwazan bû ku ew jî temsîla xwe, di desthilatdariyê de dibîne. Ji xwe yên ku li dijberî wê bangewaziyê ne jî desthilatdarin û bi tekoşîna hel re, tekez destpêka hilweşîn û şikandina wane. Û em niha di serdema şikandina mêrtiya desthilatdar dene û tekez wê serkeftina a jin û civakê be.

## Ji Pênûsa Jin

### 'Kuştina Zilam rêgeza bingehîn a sosyalîzmê ye'

**Nehîr Pale**

Pirsgirêka cinsiyetpariziya civakî, malbat û jin wê çawa were çareserkirin yek ji lêgerînên Rêber APO bû, ji pirsgirêka Kurd zêdetir girîngî da pirsgirêka cinsiyetparêziya civakî. Yek ji gavên Rêber APO yên çareserkirina vê pirsgirêkê projeya Kuştina Zilam bû. Ev proje nû bû, berî Rêber APO kesekî behsa projeyekî wisa nekiriye. Mîtolojî, ol, felsefe û zanist ticarî kuştina zilam weke proje ji çareseriya pirsgirêkên civakî re nedîtine. Kuştina zilam tê çi wateyê yan jî wê bi kîjan rêbazan ev proje were pêk anîn, Rêber APO bi berferehî vê yekê pênase dike.
Kuştina mêr nayê wateya fîzîkî zilam werin qetil kirin, di encama zîhniyeta mêr de ji 5 hezar berî zayînê heyanî niha şer didome, desthilatdarî û dagirkirin çêdibe. Di encama şerên desthilatdariyê yên mêr de jin dikevin rewşên gelekî giran de. Eger şer biqedê jin wê mîna berê neyên kuştin an jî tûndî li wan neyê kirin. Herî kêm wê derfet çêbibin ku jin xwe birêxistin bikin û bikarbin ji bo çareserkirina pirsgirêka cinsiyetparêziya civakî têbikoşin. Rêber APO kuştina zilam di wateya dawî li weknehevî û desthilatdariyê mêr anîn pênase dike û yek ji rêgezên sosyalîzmê dibîne. Sosyalîzmê bi kuştina zîhniyeta mêr dide girêdan. Ji bo mêr wekhev nêzî jinê bibe divê destpêke xwe ji zîhniyeta xwe rizgar bike, eger ferasetên xwe yên li beramberî jin nede guhertin wê nikarbe bibêje ez sosyalîst û demokratim.
Berî Rêber APO tucarî mêr neketine fikara ku şaş nêzî jinê dibin û pêwîstiya wan bi guhertinê heye. Ji xwe kesek cesaret nake ku li xwe mûkir were yan jî di mijara jinê de kesayeta xwe li ber çavan derbas bike. Zilamên ku herî zêde xwe nêzî jinê dibînin û xwe ji mêrên derdora xwe baştir dibînin, pir rehet dikarin destdirêjî jinê bikin. Ji ber gunehê xwe bi jinê tînin û dibin navê bi jinên di nêrîna wan de zeyîfin dibin alîkar, çewt nêzî jinê dibin. Jinê lewaz û xwe jê xurtir dibînin, di bin navê parastinê de mafê xwe dibînin ku destwerdana her tiştê jinê bikin. Mêrên ku vekirî li hemberî jinê dijminayî dikin dibe ku ji van mêrên ku xwe demokrat dibînin kêmtir zerarê bidin jinê. Herî kêm jin li hemberî mêrên dijminayî li hemberî wê dikin, xwe diparêze lê belê nakeve ferqa divê xwe ji wan mêrên ku li ser ferasetên şaş xwe sosyalîst û demokrat dibînin, biparêz e.
Rêber APO di pirtûka `Kuştina Zilam` de dibêje lazime mêr her tim ji xwe bipirse ku wê çawa bibe gorî jinê, rexnedayîna xwe bide û têkeve nava hewldanên xwe guhertinê de. Mêr nakevin fikara ku riya sosyalîzmê di azadiya jinê re derbas dibe. Rêber APO di nameya xwe ya 8`ê Adarê de ji jinan re rêkiribû careke dîtir balkişandibû ser mijara jin û sosyalîzmê, di nameyê de gotibû ku:`Riya sosyalîzm di azadiya jinê re derbas dibe, heyanî jin azad nebe hûn nikarin bighîjin sosyalîzmê. Di nêzîkatiyên mêr ji jinê re diyar dibe ku çiqasî sosyalîst e`.
Girêdayî vê mijarê divê ew ferasetên ku mêr her tim mînak ji jinê re tê dayîn, ji kokê were rakirin heyanî ku zilam destpê bike rexnedayîna xwe ji jinê re bide û pêdiviya xwe bi guhertinê bibîne.



# Melevan Resûl; Aşiqê zimanê kurdî

Nivîskar Melevan Resûl diyar kir ku wî ciwaniya peyva Kurdî di çîrok û çîvanokên kevneşopiya Kurdî ji devê dayîk û xwîşka xwe ya mezin bihîstin, roj bi roj heskirina ziman û çanda devokî di dilê wî de mezin bû û bû aşiqê zimanê xwe.

**Ayşa Silêman/Dêrik**



Nivîskarê kurd Melevan Resûl di sala 1960'î li gundê Hemze Begê yê girêdayî bajarê Dêrikê jidayîk bûye, wî xwendina xwe ya seretayî, navîn û amedeyî qedand û bidawî kir û xwendina xwe a fakolte li bajarên cûrbicûr yên Sûrî derbas kir, di wan qûnaxan de tevlî xebatên ramyarî dibû û herdem ew ji bo wêjeya kurdî li pêş bû.


Di derbarê jiyan, kar û xebatên xwe de, nivîskarê kurd Melevan Resûl kirî ji Rojnameya me re axivî.


### Xebata wêjeyî

Melevan Resûl da zanîn ku wî di salên 1980'î de dest bi nivîsandina helbestê kir û wiha got: "Naskirina min ji gelek helbestvanên wekî Seydayî Cegerxwîn û Seydayê Tîrêj re hebû, min berê xwe da helbesta kilasîk û roj bi roj hînî terazûya helbesta bûm, lê helbestê ez têr nekirim, lewma min berê xwe da nivîsandina gotar, pexşan, şano û vekolînên wêjeya kurdî. Piraniya nivîsên min bi zimanê kurdî ne û beşek bi zimanê Erebî jî hene, min nivîsên xwe di dezgehên ragihandin, rûpelên rojname û kovarên kurdî û weşana elktronî de belav kirine."

### Kar û xebatên Melevan Resûl

Resûl diyar kir ku wî gelek kar û xebat dane meşandin û wiha got: "Heta niha min 6 dîwan ji helbestên kevneşop û nûjen nivîsandine. 65 şano û sikêtiş nivîsandine û 3 celeb li ber çapê ne. Min lêkolîn bi zimanê kurdî û erebî kirin. Di heman demê de Pirtûkek xwerû bi zimanê Erebî bi navê 'Fî Zehmet Elkelwan wel Belot' li ber çapê ye û Çîrok 2 celeb ew jî li ber çapê ne. Herwiha Pêtirî 300 gotarî bi zimanê kurdî û erebî piraniya wan hatine weşandin. Min pêşkêşvanî jî kiriye û nêzî 285 xelekî bi niviskar û ronakbîran kişandiye. Avakirina dezgehên radiyo, Tv û ragihandina azad li Rojava. Di heman demê de lêkolîn û ravekirina navdar û mîrnişînên kurd, 13 vekolînên berfereh wekî belgefilim ji bo TV hatine tomar kirin û weşandin, bi navê Şopên Dîroka kurdistanê. 3 celeb ji vekolînên ramyarî bi zimanê Erebî jî nivîsîne û hejmarek berfereh ji nivîsên torevanî û semînerên wêjeyî û hîn jî berdewam dikim. Di heman demê de pirtûkek bi zimanê Erebî li ser jiyana Şehîd Polat Herekol nivîsadiye. Heftane min nivîs di kovar û rojnamegeriya kurdî de dinvîsandin wek; Serxwebûn, Rojda, Rewşenbîr, Şermola, Sîwan, Destar, Dicle, Sorgul, Ronahî û Ajansa ANHA de. Xebatek berfereh di avakirina Sazî û Yekîtiyên Rewşenbîrî û Wêjeyî li Rojavayê Kurdistanê kiriye. Di heman demê de beşdar gelek aheng û festîvalan li Rojava û ji derveyî welat bûme. Her wiha çavdêr, rexnevan û sererastkirina gelek berhemên nivîskarên kurd di warê rastnivîs û rêzimanî de kiriye û heya niha jî berdewam im û komxebatên ziman û wêjeya kurdî didim."




### Berhemên çapkirî

Resûl di berdewamiya axaftinên xwe de wiha got: "3 dîwanên helbestî bi navê Aram, Arîn û Çirîsk hatine çapkirine. Di heman demê de şanoyên bi navê Cihê Hêvî û daxwazan û Qevdek Kezî jî hatin çapkirin. Çîroka bi navê Reş wê werin ser sorgulan û di heman demê de 3celeb ji gotar û nivîsên ronakbîrî jî hatine çapkirin. Her wiha 13 babet, dukomenter û belgefilim ji Hilweşîna mîrnişînên kurdî. Di heman demê de bi zimanê erebî jî nirxandin û lêkolînên ramyarî û wêjeyî jî hetine çapkirin. Gelek berhemên min bi zimanê Erebî û Kurdî jî hîn reşnivîsin, lê ji ber kêmderfetiyê nehatin e çapkirin."

### Xelatên ku Melevan Resûl bi dest xistine

Nivîskar Melevan Resûl axaftinên xwe bidawî kir û wiha got: "Min cihê xwe di piraniya ahing û fistîvalên hunerî û wêjeyî de girtiye. Her weha min hejmarek xelatên wêjevaniyê jî wergirtin e, xelata mehrecana 14'an a helbesta kurdî li Sûriye, xelata navenda zimanê kurdî, xelata saziya zimanê kurdî, xelata saziya hînkirin û perwerdeya zimanê kurdî, saziya Dicle ya rewşenbîrî. Her wiha sertefîka şanaziyê ji enistato, sandîke û navendên lêkolîna wêjeyî ya kurdî xelat wegirtine, xelatên herêmî ji partî, kesayet, navdarên ronakbîr, sazî û rêxistinên navçeyî bi dest xistine. Giraniya xebata min di 12 salên dawî de di çêkirina bernameyên ronakbîrî di TV û Radiyoyê de li pêşin û hîna berdewam in."

# Koma Agirî 39 sal in xizmeta şoreşê dike

**Navenda Nûçeyan**

**Sazûmankarê Koma Agirî Menal Heskulek diyar kir ku 39 sal berê li ser pêşniyara Mûrad Karayilan bi 2 keç û kurê xwe Koma Agirî ava kirin û wiha got: "Koma Agirî berhemeke pêla şoreşê bû û ev 39 salin xizmeta şoreşê dike."**

Koma Agirî di 1986'an de ji hêla helbestvan û dengbêj Menal Heskulek ve hat avakirin. Koma Agirî di sala 1988'an de kasêtek bi navê Zarokên Agirî derxist. Di sala 1989'an de kasêta sêyemîn bi navê "Apoyê me tifing e" ku ji 12 stranan pêk tê derxist. Koma Agirî kasêtên "Ev der Kurdistan e", "Zindana Diyarbekirê" derxist. Stranên Koma Agirî li çar aliyên Kurdistanê bandor kir. Gelek endamên Koma Agirî tevlî nava refên gerîla bûn û nêzî 30 şehîdên wê hene. Helbestvan û sazûmankarê Koma Agirî Menal Heskulek li ser avakirina Koma Agirî û xebatên xwe axivî.

Menal Heskulek diyar kir ku yek ji pêşeng û fermandarê PKK'ê Mûrad Karayilan di 1986'an de rojekê bû mêvanê wan û wiha qala wê rojê kir: "Murad Karayilan dît ku ez bi helbest û dengbêjiyê re mijûl dibim ji min re got; 'Tu dikarî komekê ava bikî?' Min jî bersiva erênî dayê. Min 2 keç û kurê xwe amade kir. Min ji wan re li tembûrê xist, zarokên min jî stran gotin. Stranên me eciband. Piştî mêvandariya Murad Karayilan min bi zarokên xwe re bingeha Koma Agirî avêt. Li ser vê yekê me di demek nêzîk de komek mezin ava kir. Nêzî salekê 150 endamên komê çêbûn. Komê di nava civakê de pêşketinek mezin ava kir. Navê komê heta li Cizîrê belav bûbû." Menal Heskulek bi van gotinan wan rojan bibîr tîne: "Koma Agirî berhemeke pêla şoreşê bû." Menal Heskulek şoreşê tenê bi çekê bi sînor nake û dibêje: "Çand û huner tune be, ew şoreş naçe serî. Di salên 1986'an de me xwest şoreşek çandî pêş bixin." Menal Heskulek li ser 'Çima navê Koma Agirî, rawestiya û got: "Îhsan Nûrî Paşa wê demê li Agirî şoreşek pêk anî. Me bi Koma Agirî xwest wê şoreşê nemir bikin."



Yek ji endamê Koma Agirî û Hevserokê Çand û Hunera Cemîl Huro ya Helebê Seid Bîrhat e. Seîd Bîrhat jî kedeke mezin daye Koma Agirî. Di salên 1980'î de bi bayê şoreşê re li Helebê komên çand û hunerê hatin avakirin. Piştî 1980'î li Helebê Koma Agirî, Koma Aştî, Koma Armanc hat ava kirin. Ew komên hatin avakirin girêdayî partiyan bûn. Piştî bayê Şoreşê li Rojava belav dibe, kom jî têne avakirin. Wê dema ku Koma Agirî hat avakirin û banga pêşxistina şoreşê dikir. Koma Agirî di salekê de qasêtekê çap dike. Wê demê ji ber şertan hemû endamên komê nikarin bi hevre bixebitin.
Endamê Koma Agirî Saîd Bîrhat ê ku di sala 1987'an de tevlî Koma Agirî bû, balê dikişîne ser pişaftina çandê û van hişyariyan dide: "Xebata komê serkeftî bû. Her çend êş û zehmetî li ser wan hebû jî, her çend rejîmê ew 3 caran binçav kir jî xebatên me serkeftî ne. Koma me heya niha jî didome. Lê wê demê tevî derfetên kêm û amûrên kêm xebata me gelek baş bû. Êdî wekî berê çand ne xurt e. Her ku diçe çanda Kurdan dihele. Divê hemû hunermend li çanda xwe vegerin."

### 'Murad Karayilan pêşniyar kir, me ava kir'

Murad Karaliyan di sala 1986'an de dibe mêvanê Sazumankarê Koma Agirî Menal Heskulek. Li ser pêşniyara Murat Karayilan a 'Tu dikare koma muzîkê ava bike?' Helbestvan Menal Heskulek 2 keç û kurê xwe kom dike û Koma Agirî ava dike. Koma bi 3 kesan ava bû 39 salin xizmeta şoreşê dike.

# 'Bi hişmendiya DAIŞ'ê jinên Berava Sûriyê tên kuştin'

Rêveberiya Rêxistina Sara Nisriya Mehmûd diyar kir ku HTŞ'ê bi hişmendiya DAIŞ'ê jinên Berava Sûriyê dikujin û wiha got: "Pêwîst e hêzên navneteweyî li hemberî komkujiyên li Berava Sûriyê tên kirin bêdeng nemînin."

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Piştî hilweşêna rêjîma Baas rewş li tevahî Sûriyê hat guhrtin, piştî hatina HTŞ'ê gefên qirkirin û komkujiyan li ser pêkhateyên Sûriyê zêde bû. Di 7'ê Adarê 2025'an cîhanê çavê xwe li ser qirkirina gelê elewî vekir. Çêkdarên HTŞ'ê li Berava Sûriyê bê serûber Elewî kuştin, ji xwe yê herî zêde para xwe ji kuştin, revandin û binpêkirinan girt, jinên Elewî bûn. Derbarê revandina jinên Elewî li Berava Sûriyê rêvebera Rêxistina Sara a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Nisriya Mehmûd ji rojnameya me re axivî.



**'Piştî hatina desthilata Şamê rewşa Berava Sûriyê aloztir bû'**

Nisriye Mehmûd destnîşan kir ku piştî hatina desthilata Şamê rewşa Berava Sûriyê xerabtir bû û wiha got: "Weke tê zanîn piştî hatina desthilata Şamê li ser desthilatdariyê rewşa Berava Sûriyê ber bi xerabûnê ve diçe, qetilkirin, komkujî û binpêkirin bi serê gelê Elewî de tê kirin. Jin tên revandin û qetilkirin, çekdar kiryarên xerab bi serê jin û zarokan de dikin. Deshilata Şamê li hemberî komkujiyên xwe bêdeng kir û hewil da komkujiyan veşêre. Li gorî hin agahiyan , hin jinên ku ji aliyê çekdarên HTŞ'ê hatin revandin niha ew jin tê kirîn û firotin, sûcên dijmirovî jî di derheqê wan de tê kirin."




**'Qirkirina jin, qirkirrina civakê ye'**

Nisriya diyar kir ku bêdengiya li hember vê komkujiyê bêwijdaniya hêzên cîhanî eşkere dike û wiha domand: "Bêdengî li hemberî van kiryarên xerab yê di derheqê jin û zarokan de tê meşandin, aloziyê û bêmafiyê diyar dike. Tecewîza ku li ser jin tê kirin ji aliyê desthilata Şamê ve, ji kiryar û terzê DAÎŞ'ê ne dûre, çavgirtina li hemberî van komkujiyan dagirkeriyê û neqebûlkirina mafê jinê diyar dike. Divê bêdengî li hember bêmafî û tecewîza ku li ser jinê tê kirin bê seknandin, ev kiryarên xerab yên li ser gelê Elewî tê kirin mafê mirovbûnê diyar nake, lê desthilatdarî û qirkirinê diyar dike."

'Pêwîst e hêzên navneteweyî komkujiyên li dijî jinan rawestînin'

Rêveberê Rêxistina Sara a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Nisriya Mehmûd di dawiya axaftina xwe de bang li tevahî rêxistinên mafê mirovan kir û wiha got: "Banga me ji bo tevahî rêxistinan û dewletên navnetew ku bi gelê Elewî re alîkarbin û ev komkujiyên ku li ser wan tên kirin, werin bi dawî kirin. Hemû rêxistin û destgehên jinan divê xwedî li van jinan derkevin û ew çeteyên ku kiryarê xerab bi wan jina dikin werin cezakirin."

# 'Bi saya şoreşê min firoşgeheke şêraniyê vekir'

**Berçem Silêman/Dêrik**

**Jina bi navê Xunav Ehmed ku xwediya firoşgeha şêraniyê ye diyar kir ku bi saya Şoreşa Rojava jinê karî gelek gavên serkeftî bavêje û wiha got: "Şoreşê bandor li min kir da ku ez û xwişkên xwe firoşgeheke şîraniyê vekin."**

Piştî şoreşa 19'ê Tîrmehê gelek jin û ciwanan hewil dan bi rêya vekirina pirojeyên taybet yên biçûk aboriya xwe pêşbixin û xeyalên xwe pêk bînin. Yek ji jinên ku ji bo pêşxistina aboriyê firoşgeheke şêraniyê di sala 2018'an de li bajarê Dêrikê vekir, jina Kobanî Xunav Ehmed e ku bi 4 xuşkên xwe re ev firoşgeh vikir û niha nêzî 7 karmendan tê de kar dikin.

Di derbarê vekirin, kar û xebatên firoşgeha şêraniya ya bi navê Yasmîn, xwdiya firoşgehê Xunav Ehmed ji Rojnameya me re axivî.

**Şêraniya Yasmîn**

Jin Kobanî Xunav Ehmed di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Destpêkê em li Şamê bûn ,li wir nêzî 8 salan min di cihê şêraniyê de kar kir û ez fêrî çêkirina şêraniyê bûm. Dema em hatin bajrê Dêrikê ez û sê xwîşkên xwe û bi alîkariya birayê min jî me nîqaş kir û em pirojeyeke bi vî rengî vekin. Ev yek ji bo me cihê serbilindahiyê bû ku me karî em vê pirojeya xwe pêk bînin. Di avakirina vî cihî de bavê me destek da me da ku em gavek wisa bavêjin. Di destpêka vekirinê de kar gelek baş derbas dibû, lê niha dolar gelek bandor li kar kir, ev yek hêlişt ku çûn û hatin kêm bibe. Raste niha buhayê dolar daketiye lê hîn em her tiştî bi buhayekî giran dikrin. Astengiya ku rastî me tê di milê kêmbûna kare û buhayê kelûpelan de ye."

**'Eger xwesteka mirov hebe astengî ji holê radibin'**

Xunav Ehmed bang li tevahî jinan kir ku bi îradeyeke xurt xewin û xeyalên xwe pêk bînin û axaftina xwe wiha qedand: "Hêviya min ew e ku rewşa Sûrî ber bi başiyê vê here û kar vegere weke berê. Di heman demê de her jineke ku xwedî xewn be, bila xewnên xwe pêk bîne ji ber ku dema xwesteka mirov hebe tu astengî nikarin pêşiya mirov bigre."



# Çolbistan; Dîrokek dirêj û dewlemend

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Gundê Çolbistan yek ji cihên balkêşên dîrokî û çandî yên kantona Cizîrê ye. Tê texmînkirin ku ev gundê di navbera sala 1933'an û 1934'an de hatiye avakirin. Ev gund statûya xwe ji xwezaya xwe ya bedew werdigire, ji ber wê jî dibe cihê pîrozkirina cejnên herêmê.**

Çolbistan gundekî dîrokî ye ku li kantona Cizîrê ya Rojavayê Kurdistanê ye, ew dikeve ser rêya di navbera bajarên Dirbêsiyê û Hesekê de û 40 km dûrî bajarê Dirbêsiyê ye. Ew herêmek 6,000 donim erd digire. Ev gund bi dîroka xwe ya kevnar û mîrateya çandî ya dewlemend navdar e.



Çolbistan ji aliyê bakur ve bi gundê El-Salihiya, ji rojava bi gundê Xatûna, ji başûr bi gundê Xeşma û ji aliyê rojhilat ve bi bajarokê El-Sikr ve tê sînorkirin. Têkiliya mirovên van gundan bi hev re heye, ji ber hê jî urf û edetên berê yên gundiyan diparêzin. Rehên gundê Çolbistan vedigere serdemên kevnar, şahidê derbasbûna gelek şaristaniyan e ku şopa xwe li her quncikekî gund hiştine. Ji abîdeyên kevnar heta mîmariya kevneşopî, Çolbistan ji dîroka xwe ya kevnar çîrokan vedibêje. Xelkên gundê Çolbistan ê bi çandiniyê û kedîkirina lawiran debarên xwe yên jiyanê dikin.

**Cihê wê yê erdnîgarî û sedema navê wê**

Gundê Çol Bistan jî bi mîrateyên xwe yên çandî yên cihêreng tê naskirin, ku nasnameyên cihêreng ên niştecihên wê û bandora çandên cuda li ser pêşketina gund nîşan dide. Ziyaretkar dikarin cihên dîrokî bigerin û beşdarî bûyerên çandî yên bi rêkûpêk têne organîzekirin bibin, li serpêhatiya xwe kûrahiyek zêde bikin. Çolbistan ku ji hêla xwezaya spehî ya ku dora gund dorpêçkirî ye, cihek aramiyê ye û cihek hêja ye ku mirov sardana wê bike, da ku ji bedewiya wê ya xwezayî û xweşikiya dîrokî sûd werbigire.

Navê Çolbistan ji demên kevnar vedigere û gund di hemû serdeman de bûye şahidê cihêrengiya çandî. Ji xwe jî di roja îroyîn de eşîrên Umrî û Îsmaîlî li vî gundî dijîn û têkiliya wan bi yekîtî, hezkirin û rêzgirtinê ve girêdayî ye. 40 Mal li gund hene û hejmarên mirovên wê zêdetirî sedî ye. Gundê Çolbistanê rastiya xwe ya berê û ya îroyîn parastiye û nasnameya xwe ya netewî jî parastiye. Gelek ciwanên gund ji destpêka şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve tevlî şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûne. Her wiha gund di rêya azadiya gelên herêmê û serkeftina şoreşa wan de gelek şehîd dane.



# Kampa Holê; Paşguhkirina navneteweyî xeteriyê zêde dike

Kampa Holê ku yek ji kampên herî xerternak li ser asta cîhanê ye û heta niha tu çareserî jê re nehatiye peydakirin. Paşguhkirina hêzên navneteweyî ji kampê xeteriya zindîkirina hişmendiya DAIŞ'ê zêdetir dike.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Kampa Holê ku li rojhilatê bajarê Hesekê ye û li nêzî sînorê Iraqê ye, ji kampên herî xeternak e li ser asta cîhanê . Kamp sala 1991'an ji bo bicihkirina penaberên Iraqê yên ji Şerê Kendavê yê Duyemîn reviyane, hatibû avakirin. Piştî bidawîbûna şer penaberên Iraqê vegeriyan û kamp hat girtin. Lê bi êrişa li dijî Iraqê ya 2003yan re kamp dîsa hate vekirin. Bi destpêka krîza Sûriyeyê re çeteyên DAIŞê kamp dagir kir û bajarê Holê ji bo çûn û hatina di navbera Iraq û Sûriyeyê de bi kar anî. Di 15'ê Mijdara 2015'an de HSD'ê bajarê Holê û kampa wê ji DAIŞê rizgar kirin û tê de koçberên Sûriyeyê yên ji şerê di navbera hikumeta Şamê, komên dewleta Tirk, Cebhet El Nusra û DAIŞê de reviyane, bi cih kirin.

**Piştî rizgarkirina Baxozê**

Piştî têkbirina DAIŞê di Adara 2019an de li Baxozê ya Dêrazorê nêzî 12 hezar DAIŞî hatin girtin ku niha di girtîgehên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de ne. Malbatên DAIŞiyan di kampa Holê de hatin bicihkirin. Di buhara 2019an de hejmara kesên li kampê hatibûn bicihkkrin nêzî 74 hezar kes bûn, ji wan 50 hezar ji malbatên çeteyên DAIŞ'ê yên Sûrî, iraqî û biyanî ne. Piştî ku hin malbatên Sûrî û Iraqî yên ku destên wan neketiye xwîna gelê Sûriyê û Iraqê ji kampê hatin derxistin, hin dewletên biyanî jî welatiyên xwe vegerandin ba xwe.



**Nêzî 35 hezar kes li kampê dimînin**

Li gorî daneyên fermî yên rêveberiya kampê, niha bi giştî nêzî 13 hezar û 124 penaberên Iraqî û 15 hezar û 805 koçberên Sûrî, 6 hezar û 385 jin û zarokên çeteyên DAIŞî li kampê dimînin.

**Operasyonên Ewlehiyê:**

Herdem ji bo ji bo serdegirtina şaneyên DAIŞê û têkbirina fikr û rêxistinbûyîna tundraw di hundirê kampê de, herwiha têkbirina planên derxistina tevliheviyan û reva ji kampê, Hêzên Ewlekariya Hundirîn ên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi piştgiriya YPJ û HSDê rêzeoperasyonên ewlehiyê li kampê didinlidarxistin. Operasyonên ku heta niha hatine lidarxistin wiha ne:

-Qonaxa yekemîn a Operasyona Mirovî û Ewlehiyê di 28'ê Adara 2021'an de dest pê kir û heta 2'yê Nîsanê dom kir. Di vê qonaxê de 125 endamên şaneyên veşartî yên çeteyên DAIŞ'ê hatin girtin.

-Qonaxa duyemîn a Operasyona Ewlehî û Mirovahî di 25'ê Tebaxa 2022'an de dest pê kir û 24 rojan dewam kir. Di vê qonaxê de jî 226 çete hatin girtin, 25 tunel hatin vedîtin û hejmareke mezin a teqemenî, çek, cebilxane û amûrên din hatin desteserkirin. Herwiha 4 jinên Êzidî ku ji aliyê çeteyan ve hatibû qeydkirin û îşkence li wan dihat kirin, ji aliyê YPJ'ê ve hatin rizgarkirin.

-Qonaxa sêyemîn a operasyonê di 27'ê Çileya 2024'an de dest pê kir û 10 rojan dom kir. Di vê qonaxê de 85 çeteyên DAIŞ'ê û hevkarên wan hatin girtin û 5 tunel hatin vedîtin û rûxandin.Di operasyonê de serçeteyê bi navê Ebû Sufyan El Luheybî ku berpirsê karên terorî di hundir û derveyî kampê de bû, hat kuştin. Keçeke Êzidî bi navê Kovan Îdo Xirto ku berî bi 10 salan di êrişa li dijî Şengalê de hatibû revandin, ji aliyê YPJ'ê ve hat rizgarkirin.

-Di 6'ê Mijdara 2024'an de li kampa Holê "Operasyona Ewlehiya Domdar" hat destpêkirin. Ev operasyon li derdora kampê û herêmên gundewar hat destpêkirin. Di operasyonê de zêdetirî 100 kîlomtre çargoşe hat paqijkirin, 79 çete hatin girtin, cenazeya jinekê bi destê "Hesba jinan" hatibû kuştin, hat dîtin.

-Hêzên Ewlekariya Hundirîn li kampa Holê, di 18'ê Nîsana 2025'an de, operasyoneke nû dane destpêkirin û di vê operasyonê de 20 endamên DAIŞ'ê û hevkarên wan hatin girtin.Herwiha jimareke mezin ji çek , çebilxane û amûrên tekînîkî yên şaneyên DAIŞ'ê hatin desteserkirin. Tevî hewldanên ewlehî yên mezin ku Asayîş, YPJ û QSD'ê pêk tînin, lê paşguhkirina navneteweyî ji kampê re, gefan zêde dike. Piranî dewletên rojavayî red dikin ku welatiyên xwe vegerînin û ji berpirsiyariyên xwe yên exlaqî û qanûnî direvin.

Derbarê rewşa giştî ya kampa Holê ji rojnameya me re axivî û wiha got: "Jimara giştî ya kampê niha nêzî 35 hezar kesî ye. Di dema dawî de li ser bingeha peymana ku di navbera hikumeta Iraqê û QSD'ê de çêbûye, dem bi dem jimarek ji malbatên Iraqî ji kampê derdikevin û radestî hikumeta Iraqê tên kirin, Ji destpêka sala 2025'an û heta niha nêzî 5 hezar Iraqî vegeriyan welatê xwe."

**'Jinên DAIŞî hewil didin ku hişmendiya DAIŞ zindî bikin'**

Cîhan Henan derbarê pirsgirêkên ku li kamp derdikevi wiha anî ziman: "Di demên dawî de ji ber kêmbûna alîkariyên mirovî û xizmetguzarî ji aliyê rêxistinên navneteweyî ve, herwiha qutkirina alîkariyê ji aliyê DYA li ser kampê; gelek zehmetî derketin, bi taybet di milî mirovî de gelek pirsgirêk hatin pêşberî me. Yan din jî rewşa Sûriyê bi giştî piştî têkçûna rêjîma Baas bandor li kampê kir û rewş henekî tevlihev kir. Ji xwe milê herî xeternak ku bandorê li ser rewşa kampê dike û ji bo tevahî cîhanê xeter e, belavbûna zihniyeta DAIŞ'ê di nava zarokên kampê de. Ji ber ku jinên çeteyên DAIŞ'ê zarokên xwe li ser vê hişmendiya tundirew mezin dikin, ev zarok jî eger mezin bibin wê li ser tevahî cîhanê bibin xeteriyeke mezin. Li hemberî wê jî, ji bo guhrtina vê hişmendiyê tu perwerde an bernameyên pêwîst ji bo zarokan nayên dayîn."

**'Ji bo têkbirina pilanên şaneyên DAIŞ'ê operasyon tên lidarxistin'**

Cîhan Henan da xuyakirin ku ji bo parastina ewlehiya kampê û tekbirina pilanên reva malbatên çeteyan, hêzên ewlekariya Hundirîn li gorî pêwîstiyê operasyonên ewlehiyê dide destpêkirin û wiha got: "Her dema ku ihtiyac tê dîtin operasyonên ewlehiyê ji aliyê QSD, YPJ û hêzên ewlekariyê ve tên destpêkirin. Dem şaneyên çeteyên DAIŞ'ê di nava kampê de çalak dibin û hewldanên revandina çeteyan ji kampê çîdibin, operasyonê ewlehiyê tên lidarxistin."

**'Paşguhkirin hêzên navnetyeweyî ji kampê xeteriyê zêdetir dike'**

Rêveberiya Kampa Holê Cîhan Henan banga li welatên cîhanê kir ku welatiyên ji kampên bibin û wiha qedand: "Pêwîst e her welatên ku welatiyên wan yên ji malbatên DAIŞ'ê li kampê ne bên welatiyên xwe bibin, herwiha divê hêzên navneteweyî bi erkên xwe rabin û di hemû aliyan de destekdayînê bidin Rêveberiya Xweser. Bi taybet divê destekdayîna rêxistinênên mirovî zêdetir bibe û hêzên hevpeyman di warê ewlekariya kampê de destekê bidin hêzên ewlekariyê."

# 'Ev konferans, bi keda hemû pêşengên Kurdistanî pêk hat'

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

**Endama Desteya Rêveber a ENKS'ê Fesla Yûsif diyar kir ku rola hemû pêşengên Kurdistanî di lidraxistina Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî li Rojavayê Kurdistanê de hebû û wiha got: "Em rola taybet ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di yekrêzî û yekîtiya Kurdan de pîroz dibînin û hêviya azadiya wî dikin."**

Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî ya li Rojavayê Kurdistanê bi beşdarbûna zêdetirî 400 kes ji nûner û kesayetên ji rêxistin û partîyên Rojava, Başûr û Bakurê Kurdistanê, rewşenbîr, hunermend, Kurdên herêmên Sûriyeyê weke Bab, Ezaz, Heleb, Şam, Hema, rêxistinên jin û ciwanan, serokeşîran, li Qamişlo hat lidarxistin.

Di derbarê Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî li Rojavayê Kurdistanê , Endama Desteya Rêveber a ENKS'ê Fesla Yûsif ji rojnameya me re axivî.

**'Rola Rêber Apo di lidarxistina Konferansê de heye'**

Fesla Yûsif teqez kir ku rola Rêber Apo di lidarxistina Konferansa Kurdî de heye û wisa bi lêv kir: "Em bilind dinrxînin ku rol û piştgiriya Rêberê Gelê Kurd ji bo Konferansa Kurdî hebû. Herwiha pêvajoya Aştî û Demokrasiyê ya ku Rêber Abdullah Ocalan di qonaxa dawî de destpêkiriye, ne yekem car e, berî niha jî projeyên aştiyê hebûn. Rêber Apo prosesên aştî û azadiyê gelek caran li Bakurdê Kurdistanê dane meşandin, îro jî projeya Aştiyê û Demokrasiyê bi banga Rêber Apo tê domandin, em weke ENKS'ê, miletê Kurd û tevgera siyasî piştgiriya wê dikin. Herwiha serkeftinê ji bo projeyê û azadiya Rêber Apo dixwazin, bese xwîn û çek, dem dema aştiyê û azadiyê ye, êdî dema ku gelê Kurd bigihêje mafê xwe."

**'Hêviya me ew e ku konferans li gorî dilê kurdan be'**

Fesla Yûsif diyar kir ku hêviya wan ew e ku Konferansa Kurdî li gorî dilê Kurdan be û wiha domand: "Konferansa Yekrêziya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê bi beşdarbûna Kurdan ji tevahiya welat hat lidarxistin. Ev konferans cihê dilxweşiya gelê Kurd û tevgera siyasî ya Kurdî ye, lidarxistina Konferansa Kurdî yekemîn gav e ku gelê kurd li hev kom bibin û ji bo siberojê di Sûriyê de bibin yek û yekhelwestiya xwe bînin ser ziman. Di heman demê de ev konferans dibe bingehek ji bo kar û xebata kurdayetî di hemû qadan de. Bi boneya lidarxistina konferansa xwe, ji bo her kesê ku tevlî bû û piştgiriya da Konferansa Kurdî, em sipasdar in, bi taybet serokê PDK'ê Mesûd Barzanî û fermandarê Giştî yê QSD'ê Mezlûm Ebdî, rola wan di hevrêziya kurdî de li pêş bû."



**'Miletê me fişar li me kir ta ku yekrêzî çêbû'**

Endama Desteya Rêveber a ENKS'ê Fesla Yûsif destnîşan kir ku bi sedama fişar ku gel li wan kir, hevrêzî çêbû û wiha axivî: "Wekî em dizanin rola hêzên navnetewî weke Amerîka û Feransayê li diyaloga yekrêziya kurdî hebû, em sipasdarên wan in jî. Lê sedema bingehîn ku hişt yekrêziya partiyên siyasî çêbibe, fişara gelê me bû, gelê Kurd fişareke mezin li ser me çêkir ta ku yekrêzî çêbû. Em bi hêvî ne ku ef konferansê me encamên bi nirx biafrîne ku ew encam jî li gorî hêvî û daxwazên gelê Kurd be, hem jî me dilê gelê xwe şad û bextewar bikin."

# Leyla Îlhan; Banga Rêber Apo perspektîfa sedsalê ye

Endamê Komîteya Perwerdê ya Wargeha Mexmûrê Leyla Arzû Îlhan diyar kir ku Banga Rêber Apo ji bo gelê Kurd û tevahî gelên Rojhilata Navîn yên ku dikarin bibin avakarê civaka demokratîk û aşitiyê, perspektîfa sedsalê ye.

**Amara Baran/Qamişlo**

Derbarê girîngiya banga Rêber Apo a ji bo aşitî û civaka demokratîk û girîngiya çalakiya nobetê a lwargeha Mexmûrê, endama Komîteya Perwerdê ya Wargeha Mexmûrê Leyla Arzû Îlham ji rojnameya me re axivî.

**'Gelê Kurd pêşengtiyê ji banga Rêber Apo re dike'**

Leyla Îlhan diyar kir ku Rêber Apo a di 27'ê Sibatê de bangekî dîrokî ji bo gelê kurd û tevahiya Rojhilata Navîn kir û wiha got: "Banga Rêber Apo ji bo gelê kurd û hemû pêkhateyên ku li Rojhilata Navîn jiyan dikin perspektîfa sedsalê ye. Hêzên desthilatdar û hêzên hegemon yên cîhanî ji bo ku desthilatdariya xwe biparêzin û li ser lingan bimînin, bi rêya şer û bi cudahiya mirovan dijminatiyê di navbera civakan de didin çêkirin. Di pêvajoyekî ku li hemû cîhanê pilanên şer dihatin meşandin, Rêber Apo banga aşitî û civaka demokrasiya gelan kir. Pêşengê banga aşitî û civaka demokratîk a gelan, gelê kurd e di şexsê Tevgera Azadiyê û xeta Apoyî ku roj bi roj li hemberê sîstema desthilatdar bandorekî erênî ji bo civakê dide çêkirin. Gelê kurd pêşengê wî bangê ne."

**'Rêber Apo perspektîfa reya çareseriyê danî holê'**

Leyla Îlhan da zanîn ku bi pêşengtiya hêzên hegemonîk di cîhanê de polîtîkayên şer tên meşandin û wiha domand: "Bi şerê Rûsya û Ukraniyayê DYA dixwaze ku hêzên di deste xwe de bigre. Şerê bazirganiyê yên di navbera dewletên Yekbûyî yên Amarîka û Çînê de tên meşandin hegemonya hêzên desthilatar yên ku li Rojhilata Navîn li ser qirkirina gelê kurd û qirkirina pêkhateyan tê meşandin. Taybet nêzîkatiya Awropa û DYA ku li ser hişmendiya ku wê şerê dijwar rû bide li ser wê badçeyên pir zêde ji şer re vediqetînin ew jî tê wateya ku polîtîkayên ku li ser şer bidin meşandin û hegemponya xwe bidin pêkanîn. Rêber Apo li hemberê wan polîtikayên şer perspektîfa aşitî û civaka demokratîk hem pêşkeşî gelê kurd û hemû pêkhateyên li Kurdistanê kir, rêya çareseriyê pêşanê hêzên hegemonîk ku bi rêya şer dixwezin xwe li ser Rojhilata Navîn bidin meşandin jî, kir."

**'Dewlet gav nevêje'**

Leyla bal kişand ser dengvedana banga Rêber Apo di cîhanê de û wiha got: "Li ser banga dîrokî a Rêber Apo 2 meh derbasbûn, lê dewleta Tirk heta niha tu gav ji bo aşitiyê neavêtiye. Ji bo banga Rêber Apo heta niha ji aliyê dewletê ve piştgirî nehatiye dayîn. Ji bo ku yekane şert û mercên civaka demokratîk pêk bê pêwîts e şert û mercên ku 27 salin Rêber Apo di bin tecrîd û îşkenceyek mezin de tê ragirtin bê gûhertin, taybet di çar salên dawiyê de tecrîd û îşkence qat bi qat mezin dibe, ji bo wî jî Rêber Apo di hemû aliyan de nikare dengê xwe bigîhîne cîhanê û bi awayekî tendurist perspektîfa xwe bigîhîne hemû qadan, taybet nikare perspektîfên xwe bigîhîne rêxistina ku daye avakirin. Ji bo wê dewleta Tirk bi dirêjkirina pêvajoyê re hêza heremî ku destê wê de hûnda bûye, dixwaze careke din bi dest bixe. Dewleta Tirk ji bo gav avêtina aşitiyê xwe amade nekiriye. Dewleta Tirk niha jî dixwaze ku bi rêya tune hesibandina îradeya gelê kurd û xapandinê pêvajoyê bimeşîne, Rêber Apo di hevdîtina xwe ya bi malbatê re dibeje mafdayîna gumanê gel tîne ziman."

**'Dewleta Tirk di polîtîkayên qirkirinê de bi israre'**

Leyla bal kişand ser agirbestê û wiha got: "Reber Apo di banga xwe a sedsalê de bang li PKK 'ê kir ku xwe fesih bike û çek dayne, PKK banga Rêber a ji bo aşitî û civaka demokratîk bê pêşwazî kir û da xuyakirin ku di şertên mercên guncav de ew kongrea xwe lidar bixin, herwiha dimeldest de agirbest ragihand. Lê dewleta Tir ev yek ji bo xwe wek firsat dîtiye her roj bê navber Heremên Parastina Medyayê bombebaran dike, heman demê de bê navber polîtîkayên qirkirinê hem li Rojavayê Kurdistanê hem jî Bakûrê Kurdistanê dimeşîne. Banga Rêber Apo a ku ji aliyê PKK'ê ve wek perspektîfa demê hatiye îlankirin û ji aliyê raya giştî a cîhanê ve weke aşitî û civaka demokratîk hatiye pênasekirin, lê dewleta tirk hêjî di polîtîkayên xwe yên qirkirina gelê kurd de û di polîtilkayên tasfiyekirina PKK'ê de israr dike."

**'Azadiya Rêber Apo azadiya gelê Kurd e'**

Leyla Arzu Îlhan bal kişand ser çalakiya nobetê a Wergeha Mexmûrê û wiha anî ziman: "Gelê ku ev 30 salin li Wargeha Mexmûrê dijîn li ser perspektîfa Rêber Apo xwe bi rêxistin kiriye. Bi wê perspaktîfê planên dijmin yên qirkirin û teslîmgirtinê yên ku li ser wargehê tên meşandin vala derxistiye, ji ber wê jî perspektîfa jiyanê a gelê Mexmûrê azadiya Rêber Apo wekê azadiya xwe dibînin û li ser wî esasî tekoşînê didin meşandin. Bê navber xebatên tekoşînê ji bo azadiya fîzîkî a Rêber Apo bê mîsogerkirin çalakî tên meşandin, hem ji aliyê hişmendî de hem jî di aliyê çalakiyan de sal û nîve ku bê navber ji bo pêkanîna azadiya fîzîkî a Rêber Apo ji aliyê gelê vargehê ve bi dorveger çalakiya nobetê tê meşandin . Gel di çalakiyên xwe de bi israre ku heta azadiya fîzîkî a Rêber Apo pêk tê. Ji ber ku azadiya fîzîkî a Rêber apo mîsogeriya qezançkirin û bi



destxistina mafê gerdûnî a gelê kurde. Azadiya fîzîkî a Rêber Apo mîsogeriya têkbirina polîtîkayên qirkirinê yên liser gelê kurd ku yek jiwan polîtikayan jî, polîtyîkaya koçberkirinê ku bi hezaran salin gelek gundên kurdistanê ji ber polîtîkayên şer yên dewleta tirk hatin valakirin. Gelê wargehê jî parçeyek ji mexdûrên polîtîka qirkirinê li ser gelê kurdin ji bo wî jî gelê wargehê diwî rastiyê de bi israrin heta azadiya fîzîkî a Rêber Apo mîsoger nebe wê polîtîkayên qirkirinê yên li ser gelê kurd bi dawî nebe."

Leyla Arzu Îlhan di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Wek gelê Mexmûrê û gelê Rojhilata Navîn ji bo azadiya fîzîkî a Rêber Apo erka ku dikeve ser milê me xwe di fikir û ramanên Rêber Apo de xortkirin esase. Rêber Apo dibe je ku pirtûk û perspektîfên min li ku bin ez li wir im hûn qansê min bixwînin hûnê ewqas min fam bikin û nas bikin. Wek gelê wargehê perspektîfa me ya jiyanê Rêber Apo ye heta ku azadiya Rêber Apo bêk bê emê dinava tekoşînê de bin."

# Heta çi astê cidiyeta wan heye?

**Kurdyar Direî**

Kurd ne bi dijminekî ji rêzê re dinava tekoşîn û berxwedanê de ne , dijminê li himber Kurdan, xwedî dîrokek tijî plan, pirojeyên qirkirinê, hewildanên rakirina Kurdan ji holê û kesayeta Kurd baş xwendiye. Ji nava dewletên ku li pey peymana Saykis-Pîko 1916'an û peymana Lozanê 1923'an ku hatine avakirin û Kurdistan di navbera wan de hatiye parvekirin ( Tirkîye, Sûriye û Îraq) bi taybet Tirkîyê hebûn û nebûna xwe bi tunekirina kurdan ve girêdaye û li himber Kurdan, ne tenê di asta sînorê Tirkiyê de, lê belê di asta herêmî û cîhanî de şerê hebûna Kurdan kiriye. Ne ku Îran, Sûriye û Îraq jî şerê Kurdan nekirine, na, lê belê şerê herî mezin bi Kurdan re di nava sînorên xwe de dane meşandin. Hişmendiya ku Tirkîyê ji dema bûye komar 1923'an de ku pê nêzî Kurdan dibe, li ser bingehê sedemên hilweşîna osmaniyan ava kiriye, ku dibêje "Sedema hilweşîna dewleta Osmaniyan ew bû ku pir netew û mezheb di nava xwe de himbêz dikir, lewra pêwîste ku komara Tirkiyê, komareke xwerû Tirkbin, yek al, yek ziman, yek welat! Bi wateya pêdiviya wan bi qirkirin û pişaftina çi netew û kêmnetew, ol û mezhebên cuda ji Tirkîtîyê re". Çawa ku ermen, suriyan, yûnan hatin qirkirin, pêwîste ku Kurd jî an werin qirkirin û an jî bibin Tirk. Pir siyaset di vê armancê de hatin meşandin, ji komkujiyan(Dêrsim,Agirî, Amed, Mêrdîn HWD ta şerqîslahat û koçberkirinên bê jimar ku li pey şoreşa Agiriyê 1930 de bi rehetî Tirkan di rojnameyên xwe de li jêr wêneyê Çiyayê Agiriyê nivîsandine (bûrada kurdistan muhayil medfûnler) bi wateya ku li vir kurdistana xeyalî hatiye bin ax kirin. Heger di 1978'an de partiya karkerên kurdistan avanebûna û di 1984'an de dest bi şoreşa çekdarî nekiribana, li gorî ku Tirk bi xwe jî dibêjin, dê doza kurdî di bakurê Kurdistanê de qet nemabana, Tirkiyê ketibû wê geşbîniyê de ku siyaseta wan ya bişaftin û qirkirinê biserketibû. Şoreşa 1984'an jî ji bona Kurdan, şoreşa hebûn û nebûnê bû, ew gelê ku Tirkiyê digot bin ax bûye, ji nûve hate vejînkirin, laşekî mirî û hate zindîkirin, li himber vê şoreşê Tirkiyê 5000 gundên Kurdistanê valakirn, bi hezaran mirov zindan kirin, bejahiya kurdistanê şewitandin, çekên Nato û yên qedexe bikaranîn, yek rojê jî Tirkiyê behsa aşîtî û çareseriyeke dadmend ji doza kurdî re nekiriye, di 93'an de serok wezîrê Tirkiyê Torgot Ozal behsa aştiyê kir, bi şêweyekî ne diyar jiyana xwe ji dest da. Serokê Tirkiyê Erdoagan di 2009'an de behsa aştiyê kir û di 2012'an de qaşo bi Rêber Apo re doza Kurdî çareser bike, di peyre Kurdistan hate şewitandin, ne tenê li bakur, her wiha li Rojava û başûrê Kurdistanê jî. Piştî 26 salan ji dîlgirtina Rêber Apo re di nava komploya 1998'an de û vala derxistina Tirkiyê ji hemû bangên wî yên aştiyê re, dubare Tirkiyê behsa biratî, aştî û wekheviya Kurd û Tirk di nava sînorê yekwelatî de dike, her wiha Rêber Apo jî banga xwe ya aştiyê dûbare dike, lê gelo ta çi astê cidiyeta Tirkiyê heye? Bê guman heger ev dewlet li ser textê mirinê be jî, dê wêrekiya pêkanîna aşitiyê û çareserkirina doza kurdî neke, lewra pêwiste em bi gotinên xweş û durişman neyên xapandin, çawa ku dewleta Osmanî di dawiya temenê xwe de hewildana ji nûve xwe vejînkirinê dikir û di encamê de hilweşiya, her wiha Komara Tirkiyê ya sedsal temenê xwe, ber bi hilweşînê ve diçe, gelo bi duruşmên mîna biratiya Kurd û Turk, ku Ataturk jî di şerê rêzgariyê 1919'an de bi lêv dikir û Kurd xapandin, wê dîsa kurd werin xapandin? Bê guman tevgera azadiyê û Rêber Apo baş Komara sexte nas dikin.



# 'Berxwedana Bendava Tişrînê berxwedana hebûnê ye'

Nûçegihana Jin Tv Loristan Derwîş diyar kir ku ev zêdeyî 110 rojan e li Bendava Tişrînê berxwedaniyeke bêhempa tê meşandin, herwiha destanên dîrokî tên nivîsandin û got, "Berxwedana Bendava Tişrînê berxwedana hebûnê ye."

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Dewleta Tirk û çeteyên wê di 8'ê Berfanbara 2024'an de bi awayekî hovane êrişî Bendava Tişrînê û Pira Qereqozaqê kirin. Herwiha gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo ku piştgirtiya şervanên QSD'ê bikin, bi coşeke mezin cihê xwe di nava berxwedaniyê de girtin û nehiştin ku Bendava Tişrînê bikeve destê dewleta Tirk û çeteyên wê de. Li bendava Tişrînê berxwedaneke dîrokî tê meşandin, şervanên QSD, YPG û YPJ'ê bi berxwedaniya xwe kêlî bi kêlî rastiya dewleta Tirk û çeteyên wê nîşanî cîhanê dan. Dewleta Tirk a dagirker bi aweyekî hovane li bendava Tişrînê gelek komkujî û êrişî li dijî gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêk anîn. Di encamê de 200 sivîl û di nav de jî 9 rojnamevan birîndar bûn, herwiha 25 sivîl şehîd bûn û di nava wan de 3`ê Rojnamevan jî hebûn. Derbarê berxwedana ku li bendava Tişrînê tê kirin, nûçegihane Jin Tv Loristan Derwîş ji Rojnameya me re axivî.

**'Gel heta roja îro li bendavê nobetê digire'**

Loristan Derwîş di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ji bo ku destkeftiyên şoreşê têk bibe êrişên xwe zêde dike. Di heman demê de nehêle ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê aramî pêk were. Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji



bo destkeftiyên şoreşê biparêze, bi rihê şerê gelê şoreşgerî berê xwe dan bendavê û heta roja îro nobetê dikin. Piştî banga Rêveberiya Xweser a Demokratîk bi hezaran jin, ciwan û zarok û kesên temen mezin ji 7 heta 70 salî berê xwe dan bendava berxwedanê. Tevî hemû astengiyan û êrişan gel nobeta xwe heta roja îro dibomîn in."

**'Zêdeyî 110 rojin li bendava Şehîdan berxwedaniyeke bêhempa tê meşandin'**

Loristan Derwîş anî ziman ku ev zêdeyî 110 rojane ku berxwedaniyeke bêhempa li bendava Tişrînê tê meşandin û wiha berdewam kir: " Weke tê zanîn ev çar meh in ku li bendava Tişrînê ji aliyê gel û şervanan ve berxwedanî û têkoşîneke bêhempa tê meşandin. Ev yek dide xuyakirin ku gel û şervan berxwedana bendava Şehîdan ji bo xwe berxwedana hebûnê dibînin. Dema ku ez li bendavê bûm hin dayîkan digotin heger bendava bikeve destê dewleta Tirk û çeteyên wê, em ê agir bi bedena xwexin. Herwiha dema ku dayîke 80' ê salî li ser bendavê van gotina bîne ziman ev yek dide diyarkirin ku hebûn û nebûna xwe di bendavê de dibîne. Berxwedaniya ku li bendavê tê meşandin û ango manîna gel wê derê diyar dike ku şerê gelê şoreşî zindî bûye. Gelên ku li bendava Tişrînê dimînin dibin balefirên dewleta Tirk a dagirker de jiyan dikin û li berxwe didin, herwiha mînakê vê yekî li Efrînê hatiye jiyan kirin."

**'Bendava Tişrînê Şoreşek e'**

Loristan Derwîş da zanîn ku li Bendava Tişrînê kêliyên dîrokî ji aliyê gel û şervan tên jiyankirin, herwiha berxwedana benava Şehîdan bûye nimûneye ji bo tevahiya gelên Sûriyê û wiha pê de çû: "Destanên li bendava şehîdan têne kirin hatin saz kirin, bû weke mûcîzekî cîhanî pir mezin. Berxwedana ku hate meşandin pêş de çû ji ber ku civakên rêxistinkirî gavan navêjin paş, bi piştgiriya pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê berxwedan bi ser ket û deng veda li pêşbirî cîhanê û bi taybet gelê Sûriyê. Ev berxwedaniya ku li bendava Tişrînê tê meşandin ne ew berxwedaniya ku mirov ji rêz dibîne ji ber ku li tu cihê cîhanê ne hatiya dîtin dibin balefirên şer de bi gotinên ku em ji mirinê mezintir û kefenê mirinê çirandiye gel dibin balefirên şer de berê xwe didin mirinê. Dema ku gelê me berê xwe da bendavê bi van gotinan berê xwe danê, berxwedaniya ku niha li bendavê tê meşandin vî tiştî esbat dike. Çawa ku dayîk li kêleka zarokên xwe şer kirin û xwedî li axa xwe derketin, Şoreşa Rojava li tevahiya cîhanê hatiye belavkirin, berxwedana li bendava Tişrînê jî bi srê xwe Şoreşeke."

**' Li bendavê heta vê kêliyê bêdudilî berxwedaniyeke bêhempa tê meşandin'**

Nûçegihana Jin Tv Loristan Derwîş eşker kir ku gel li bendava Tişrînê di nava toperanê de dîlan digirtin û wiha bi dawî kir: "Tiştên ku min li bendavê dîtin gotin nikare wan hesan şîrove bike, ji ber ku berxwedaniya li bendava Tişrînê li tu cihî nehateya jiyan kirin. Piştî hatin Fermandarê Giştî QSD' ê Mezlûm Ebdî û Fermandara Giştî ya YPJ' ê Rohilat Efrîn li ser bendavê hêviyeke mezin kete di dilê gel de. Li bendava Tişrînê gelek hevdîtin hatin kirin, herwiha bi hezên hevpeyîmanên navdewletî re hevdîtin hatin kirin û di heman demê de HTŞ' ê berê xwe da bendavê û bi taybet xeta cebhê. Gelek nîqaş û lihevkirin li bendavê hatin kirin û li ser hin xalan lihevkirin hatin kirin. Lê dewleta Tirk nahêle ku gel destkeftiyên xwe biparêze, dîsa xwest ku van hevdîtinan xirab bike. Lê bi rihê şerê gelê şoreşgerî li bendavê ji 8'ê Berfanbara 2024'an heta vê kêliyê bêdudilî berxwedaniyeke bêhempa tê meşandin."

## Dixwazin bi HTŞ û serjêkirinê Kurdan têk bibin

**Zekî Bedran**



Hakan Fîdan dîsa gefan li Rojava û Kurdan dixwe. Helbet sedem dîsa PKK ye. Ji ber ku ti kes li cîhanê QSD û YPG'ê weke terorîst nabîne. Tirkiye bi salan e hewl dide wan bikeve lîsteya rêxistinên terorê, lê bi ser neket. Ji ber ku YPG an jî QSD ji sala 2014'an ve bi hevpeymaniya navdewletî re li dijî DAIŞ'ê şer dike, li ti devera cîhanê tevlî ti bûyerên terorîstî nebûye. Bakurê û Rojhilat Sûriyê ji cîhanê re cihekî vekirî ye. Ji aliyê civakê ve tê birêvebirin. Li Rojhilata Navîn xwedî rêveberiya herî demokratîk û azadîxwaz e. Dewleta Tirk niha jî diçe Îmraliyê û dibêje em aştiyê pêk bînin û biratiya Kurd û Tirkan ava bikin. Lê gef li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî dixwe. Sedema metirsiyê jî diyar e PKK ye. Ji ber ku bêje ez dijminê kurdan im, ez nahêlim ev bibin, xwedî hebûn û statuyekê bin, wê cîhan hemû bertekê bide nîşan dan, Kurd jî wek hemû gelên din divê hebin û mafên xwe bi kar bînin. Di vî warî de dev ji xerabiya xwe bernade û di şexsê PKK'ê de dijminatiya xwe ya li hemberî Kurdan didomîne. Jixwe PKK di lîsteya rêxistinên terorê de cih girt. Vê yekê weke çekê li dijî Kurdan li her derê bi awayekî herî xirab bi kar tîne.

Niha li Efrînê PKK heye? Çima welatiyên Efrînê nikarin vegerin warên xwe? Efrîn ji Kurdan hat paqijkirin. Paqijiya etnîkî hatkirin. Niha rejîma Baas hilweşiyaye. HTŞ bûye desthilatiya Şamê. Çeteyên girêdayî Tirkiyeyê ji raya giştî re ragihandin ku tevlî artêşa Sûriyê bûne. Ji Ahmet Şar re got ku gelê Efrînê dê vegerin cihên xwe. Çû Efrînê. Lê koçberên Efrînê hê jî nekarîne vegerin malên xwe. Şara bi xwe jî dibêje, heta niha nikarin Efrînê bi serwer bibin û asayîşê pêk bînin. Kî gef ji ewlehiyê dike? Helbet Tirkiye û çeteyên wê. HTŞ nikare ji Tirkiyê re bêje derkeve. Nikaribe bibêje jî "Çeteyên xwe ji wir derxînin." Artêşa Tirk bi mehan bi çeteyên xwe êrîşî cihên weke Bendava Tişrînê kir. Hikûmeta Tirkiyê jî çend caran daxuyanî da û got ku hemû komên çekdar tevlî artêşa Sûriyê bibin. Eger tevlî artêşê bûne, wê demê ev êrîş ji aliyê rêveberiya HTŞ'ê ve tên kirin. Lê HTŞ dibêje ku ew ne di nava şer de ne û bi QSD'ê re agirbestek heye. Di peymana ku di 10'ê Adarê de bi QSD'ê re îmze kiribûn de jî xalek hebû ku agirbest li tevahiya Sûriyê pêk were. Niha peymana agirbestê ya ku navenda wê Bendava Tişrînê ye tê nîqaşkirin. Li gorî vê yekê hêzên girêdayî HTŞ'ê wê hêzên xwe di navbera QSD'ê û çeteyên bi navê SMO de bi cih bikin. Di hat gotin SMO û çeteyên din girêdayî artêşa Sûriyê ne? Li gorî vê yekê, diviyabû ew di bin pergala fermandariya HTŞ de bibûna. Eger SMO girêdayî HTŞ'ê be û ne artêşa Tirk be, çima HTŞ hêzek cuda bîne û li wir bicîh bik e?

Welatiyên ji herêmên Girêspî û Serêkaniyê koçber bûne jî nikarin vegerin malên xwe. Ev bajêr jî, ji aliyê artêşa Tirk ve hatine dagirkirin û çeteyên girêdayî wan li wan deran serwer in. Ti ewlehiya can û malê gelê Efrînê û van herêman nîne. Revandin, bac, îşkence û gef berdewam dikin. Bi salan e mal û milkên gel tên talankirin û nahêlin vegerin. Pirsgirêk ne ew e ku PKK li vir e. Siyasetek ku bi eşkere di dijminatiya Kurdan de ye tê meşandin. Dewleta Tirk zextê li HTŞ'ê dike û dibêje bila Kurd nebin xwedî statu. Ji ber vê yekê jî hikûmeta AKP'ê ya yekemîn bû ku destûra darbeyê ya ku HTŞ'ê çêkiribû nas kir û piştgirî da. Konseya Ewlekariya Neteweyî ya Tirk (MGK) heta niha der barê Sûriyê de biryar girt û her asta ambargoyê zêde kir. Di biryara MGK'ê de, "Dewleta neteweya yekbûyî, rêveberiya navendî, yekîtiya siyasî ya Sûriyê" û hwd. Lê piraniya gelê Sûriyê alîgirê Sûriyeke nenavendî û demokratîk e. Lê Tirkiye rejîmeke wisa li ser Sûriyê ferz dike ku mirov Baasê bigerin.

HTŞ di dema ku herî lawaz jiyan kir jî, destûrek demkî ragihand ku ji rejîma Baas'ê nîjadperestir û tundtir bû. Di demên aramî de makezagonên herî demokratîk piştî şoreşan tên çêkirin. Ji ber ku pergal hilweşiyaye, hemû hêzên muxalîf û yên demokrasiyê dixwazin vejiyan e û ketine tevger ê. Hêza ti partiyekê nîne ku bi serê xwe serdest be. Daxwazên gel ên azadiyê pêk tên û mafên wan ên demokratîk tên bidestxistin. Li seranserê welêt organîze nabe. Çavê dinyayê li te ye. Di lîsteya rêxistinên terorê de cih digire û welat di bin ambargoyê de ye. Digel vê yekê, ew destûrek pir navendî û olperest îlan dike. Ewê bi vê makezagonê 4 û 5 salan welat birêve bibe. Eşkere ye ku her ku sazûman û bi hêztir bibin, wê rejîmeke tundtir ava bikin. Tirkiye piştgiriya vê makezagon, û rejîmê dike. Dixwazin Kurdan jî ji aliyê HTŞ û çeteyên din ve bindest bikin. Ma HTŞ ji kurdan û rêxistinên wan çêtir e? Nêzîkî gelê Tirkiyê ye? Dijminatiya li hemberî Kurdan, nêrîna dewleta Tirk tarî kiriye.

Hikûmeta AKP'ê nîqaş dike ka PKK çekan berde û xwe li Îmraliyê belav bike. Rêber Apo ji bo ku şer bi dawî bibe û tevkariyê li aştiya herêmê bike, bang li PKK'ê kir ku xwe fesih bike. Rêxistineke ku wê xwe tasfiye bike çima hê jî gej lê tê xwarin? Di heman demê de jî bi navê armanckirina Kurdên Sûriyê. Weke ku tê dîtin pirsgirêk ne PKK ye. Di bin navê PKK'ê de tinekirina kurdan û bêstatu hiştina wan e.



## Nameya Xalid Beg û Rêber Apo

**Farûk Sakik**

Li Almanya li bajarê Dusseldorf duyemîn festîvala fîlmên Kurdî hebû. 40 fîlm hatin pêşkêş kirin. Di nav van fîlman de yek jî belgefîlma 'Vartinîs' bû. Fîlm behsa komkujiya Vartinisê ya sala 1993'an dike. Di malek de, malbatek, 9 kes, dayika ducanî, hatin şewitandin. Fîlm di heman demê de di festîvalê de xelata beşa mafên mirovan jî girt. Di sala 1993'an de ez li herêmê rojnamevanbûm û nûçeya vê şewatê min çêkiribû. Şahidê demê bûm.

Ji bo vê yekê dibejim; Welleh bîlleh me we efû nedikir. We me pirr êşand. Rabin rûnîn ji Ocalan re dua bikin. Ew ji bo gelê Kurd, carek dinan van êşan nejî, qalikê birîna ranake. Lê li pêşeroja gelê xwe dinêre. Mirovên mezin efûkarin. Ew jî wisaye.

Lê dewleta Tirkiyê ya xwediyê van sûcan dikarin xwe bi Kurdan bidin efû kirin. Ev şansek dawiye em didin we. Binirên welatê we hatî çi radeyî. Li qeyranên abori, siyasî binêrin hûn çawa bêçarenin.

Rewşa welatê we dişibê serdema Peymana Sewrê. We çawa xwe wê demê spart Kurdan, wa îroj dîsa we xwe avêtî bextê Kurdan. Kurd ewroj jî bi bext bûn û îro jî bibextin.

Lê wê demê bapîrên we bêbextî kirin. Kurd rabûn di destpêka salên 1920'an de bi nave Azadî rêxistinek avakirin. Wê demê Xalid Begê Cibirî nameyek daxwazan ji Meclisa demê re şand. Di nameyê de behsa xweseriyê dikir. Behsa ziman, nasname dikir ku îroj Rêber Apo jî behsa heman tiştan dike. Xalid beg jî behsa cûdabûna ji Tirkiyê nedikir. Li axa Anatoliya jiyanek bihevre, lê azad û wekhev.

Demek li benda bersiva nameyê sekînîn lê ji meclisê bersiv nedihat. Rêxistina Azadî biryara şer da. Dema ku ev biryardan bi Îngiliz û Rûsan re ketin nav danûsandinan û di pêvajoya şer de ji wan alîkarî xwestin. Herdûn dewletan jî ev daxwaza alîkariya Kurdan red kirin. Têkilliyên bi dewleta Tirkiyê re tercîh kirin.

Îroj:

Rêber Apo rêxistin avakirî, şer kirî û îroj 'nameyek' şandî meclisê û wek rêxistina azadî ew jî il benda bersiva wan e.

Rêber Apo di vê nameya xwe de dibêje; berî ku hêzên ji derve midaxle bikin, em vê meselê di nav xwe de çareser bikin. Li ser nave Kurdan difikire û mînaka rêxistina Azadî bibîr dixe.

Rêber Apo dizane ku ev dewletên hegoman wê bi Kurdan re demî li hevbikin û wê bi dewleta Tirkiyê re jî stratejîk li hevbikin. Ji bo vê yekê bû ku Sirri Sureya Onder, peyma Ocalan de, behsa 72 duwelî dikir.(Hin kesên dîroknezan. Her wek ew dewlet Kurdistanek didin Kurdan, lê Ocalan vê yekê qebûl nake)

Rêber Apo hênjî israr dike ku Meclîs bersiv bide, da ku wek rêxistina Azadî ji nû de dest bi şer neke.

Ew hêzên şerxwaz û Hakan Fîdan behsa şerê qirkirina tevgerê û Kurdan dikin. Behsa tunekirinê dikin.

Em bersiv nadin. Bersiv Şêx Murşid Xeznewî dabû û gotibû "Qaşo ji me re dibêjin, emê wan û çekên wan binerd bikin'. Oxlim bavê te nikaribû!"

Hêvîdarim Hakan Fîdan û Yaşar Guler ev peyam girtine û îro şûn de wê maqûl tevbigerin.

Tîr ji kevanê derketî û berbi azadiyê birêketî. Tu hêzek wê nikaribe vê hemleya dîrokî bide seknandin. Teqez wê encam were girtin.

Bila carek dinan bikevin arşîva û nameya Xalid Begê Cibirî bixwînin û bersiv bidin nameya Rêber Apo.